


"BI ZIMANEKÎ NAYÊZANÎN"
DANASÎNA ZANAYEKÎ:

APÊ MÛSA

Mûsa Anter di nivîsên xwe de bi şêweya xwe ya pêkenî û zimanê xwe yê mîzahî û xweştamî, mirovan dixê nav azweriya xwendinê û meriv êdî hez nake jê biqete... Apê Mûsa vê tehera xwe, di berhema xwe ya "Bîranînên Min" de dema ku xwe dide nasîn jî pêk tîne. Bi rastî dema ku min xwend, wê demê min fêhm kir ku di nivîsê de xwemalî, mirovan tu carê nade jibîrkirin û her dem cihek taybet jê re dihêle. Gelo Apê Mûsa çi gotibû ku ez ew qas di bin teşîrê de mam. Belê bêyî ku em dirêj bikin, bi kurt û kurmancî em bi pêkenoka Apê Mûsa destpêbikin:



"Dema ku Rezaîzade Ercüment Ekrem Talu, qala jiyana xwe dike, cihê jidayikbûna xwe û mala bavê xwe wiha dide nasîn: " Herêma Marmara, di Tirkiyeyê de herêma herî şareza ye; Stenbol, bajarê Marmarayê yê herî bedew e; Boğaziçi, taxa Stenbolê ya herî narîn e. Sarıyer, navçeya Stenbolê ya her şêrîn e; Yeni Mahalle, taxa Sarıyerê ya herî xweştir e û koşka Rezaîzadeyan koşka Yeni Mahalleyê ya herî newaze ye... A ez li vir hatim dinê." Belê, ew kurê Rezaîzade Ekrem bû. De ka îcar em bizivirin û li min binêrin: Kurdistan di Tirkiyeyê de cihê herî paşmayî ye; Mêrdîn, di Kurdistanê de bajarê herî paşdemayî ye; Nisêbîn, navçeya Mêrdînê ya herî bi derd e; Stîllîlê (çem), nehiya Nisêbînê ya herî xizan e; Zivingê (Şikefta kevin), gundê Stîllîlê yê herî paşdemayî ye û ez di vî gundê de li gor gocika gelheyê, di şikefta bi jimareya duyemîn de welidîme."

MÛSA ANTER KÎ YE?

Apê Mûsa, tam nediya e ku di kîjan salê de hatiye dinyayê. Lê qasê ku wî û dayika xwe hesab kirine, ev derketiye holê: "Diya min

digot, **‘Piştî Fermana Fileha tu hatî dinyayê.’** Ji ber ku komkujiya Ermeniyana di sala 1915an de destpêkir û di sala 1917an de qediya. Ez dikarim bibêjim ku yan 1917 yan jî di 1918an de hatime dinyayê.” Herçiqas heval û hogirên wî jê re gotibin: “Kuro Şêxo (Mûsa) eyb nîne ku tê biçî dibistanê? Tu yê bixwînî û piştê bibî Efendiyê me û me rezîl bikî?”² dîsa jî Apê Mûsa xwend û bawer im ne tenê malbat, gundî, heval û hogirên xwe, gelê Kurd hemû ezîz û serfiraz kir. Ji ber vê yekê wî xwendina xwe ya seretayî li Mêrdînê û ya navîn jî li Edenê kir. Piştê çû fakulte ya dadê ya Zanîngeha Stenbolê. Di sala 1941an de hate Stenbolê û piştê sê salên din şûnde bi keça Abdurrahim Rahmî Zapsu, Ayşe Hale Xanimê re zewicî. Bi navê Anter, Raşan,



Dicle sê zarê wan çêbûn. Mîna her zarê Kurdan ê hemiyetperwer Mûsa Anter jî bi derd, kul, keser û nexweşiyên xwe û yê gelê xwe gelek baş dizanibûn. Ji ber vê jî her tiştî re amade bû. Ji jiyane bigre heya mirinê. Sedem ev helwesta wî bû ku zilm û xedîr pê re hate kirin û di sala 1992an de li Amedê hate qetilkirin.

NIVÎS Û ÇALAKIYÊN WÎ?

Avahiya xwendekaran a bi navê

Dicle: Ev avahî li Stenbolê hate damezrandin ji bo ku Xwendekarên Kurd ên li Stenbolê hem li warekî germ hem jî li cem hev bimînin.

Kürtleri Kurtarma Cemiyeti

(Komeleya Rizgariya Kurdan): Ev komele bi awayekî ne fermî hatibû damezirandin. Armanç, ne li ser dijminiyekê, li ser guherîn û başkirina rewşa Kurdan bû. Ji bo vê yekê li Xwendekarên Kurdan xwedî derdiket û Kurdayetiya wan bi wan dida hiskirin. Endamên wê: Mustafa Remzî Bucak, Yusuf Azizoğlu, Ziya Şerefhanoglu, Faik Bucak û Mûsa Anter bûn.

Dicle Kaynağı(1948): Rojnameyek hefteyî bû. Naverok li ser gelemşeyên Kurdan bû. **Ziman Tirkî bû.** Vê kovarê Qetlîama Geliyê Zîlanê, meseleya Şêx Seîd, Agirî, Sason, Dêrsim, Karaköprü û Otuzüçler derxistibûn rojevê.

Avahiya xwendekaran a bi navê

Firat: Di sala 1942yan de li Stenbolê ava kiriye.

Aşxaneyaya Karmend û Karkeran

a bi navê Dîcle: Di sala 1949an de hatiye damezirandin. Bi alîkariya waliyê Stenbolê ji bo ku xwarineke erzan bidin karmend û karkeran hatiye çêkirin. Heya hîlbijartina sala 1950yî hatiye domandin.

Avahiya xwendekarên keç a bi

navê Toros: Hevalekî wî yê bi navê Nizar ev avahî ava kiribû. Pişt re Mûsa Anter jê dewr girtibû. Lêbelê zêde dewam nekir û hate girtin.

Şark Mecmuası: Di sala 1951ê de piştî ku rojnameya “Dîcle Kaynağı” hate girtin, Mûsa Anter bi alîkariya Kemal Sülker ev kovar derxist. Kovareke mehane bû. Weşana xwe li Stenbolê dikir. Naveroka wê zêdetir li ser Danezana Mafên Mirovan bû, ji ber ku Kurd hay ji mafên xwe hebin. Lêbelê tenê du hejmar derketiye.

Turistik Palas: Mûsa Anter serkariya vê otêlê kiriye. Ev otêl li Amedê hatiye avakirin.

Şark Postası(1954): Bi alîkariya endezzarekî bi navê Ahmet (?) ku hevalê Mûsa Anter bû, ev rojname dihate weşandin. Zimanê wê Tirkî bû. Li Amedê dihate weşandin. Mûsa Anter tê de rojê du nivîs dinivîsandin. Navê quncik-nivîsa wî “Geciken Posta” bû.

İleri Yurd(1958): Ev rojname dema ku Mûsa Anter hê tev lê

nebibû jî derdiket. Lêbelê mirov dikare bibêje ku pir nedihate xwendin. Xwediyê wê Abdurrahman Efem Dolak bû. Lê pişt re Mûsa Anter û Canip Yıldırım bi Abdurrahman Dolak re peymanekê çêdikin û heqê weşanê jê distînin. Mûsa Anter di vê rojnameyê de nivîsên Kurdî jî dinivîsîne. Nivîsek bi navê “Ji bo Xwedê Sedeqakê” bi sernavê “Aman Ne İleri Yurd” derket. Li ser vê meselê gelek hat axaftin. Doz lê hatin vekirin. Dû re helbesta wî ya navdar a bi navê “Qimil” hate weşandin. Şîroveya wê jî bi zimanê Tirkî nivîsibû.

Hilbijartina sala 1965an û TÎP:

Mûsa Anter piştî ku (TÎP) vebû, di nav refên vê partiyê de dest bi siyasetê kir. Ji ber ku wê demê ev partî bêzîrar didît û serokê wê jî nasê wî bû tu pirsgirêk nemabû ku bikeve nav xebatan. Jixwe mijara pirsgirêka Kurdan di bin berpirsiyariya wî de bû. Lêbelê ev pêvajoyê li ser hemdê xwe nema û çend pirsgirêkên ku di navbera Mûsa Anter û Tarik Ziya Ekinci de derketibûn, ew ji hevdu qetandin. Dû re Mûsa Anter bi awayekî serbixwe li herêma Mêrdînê berendamiya xwe danî. Bi rayeke gelek zêde ku pê sê parlementer bikaribin parlementeriyê bi dest bixin rey sitandibû. Lêbelê ev jî negihîştê encamekî. Ji hêla “Ankara Hava Kuvvetleri Mahkemesi” ve

mehkûmiyeta wî hat xwestin û koçî Çanakkaleyê kirin. Lê dîsa jî heya sala 1971an têkiliya xwe bi “TÎP” ê re nebirî.

Doğ u Dergisi (1ê Kanûnê 1969): Ciwanmêrekî bi navê Mehmet Gûneş Şahiner pêşniyariya vê kovarê lê dike. Ew jî dipejirîne û dest bi weşanê dikin.

Avakirina (HEP)ê: Di sala 1988an de partî damezirandin û bixwe jî tê de cih girt.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê: Di sala 1992yan de bi çend havalên xwe re Enstîtuyê ava dikin. Di kongreya yekemîn de dibe serok.

Her wiha Mûsa Anter xêncî van çalakî û xebatan gelek xebatên cûrbecûr kirine. Qasê ku min xwend û dît Apê Mûsa meriv dikare bibêje yek deqeyek nesekiniye. Ez bi xwendina xizmetên wî westiyam, lê ew bi 74 salên wek 74 emran mîna ku çiqas xizmet kiribe, ew qas jê zewq girtiye û xebitiye.

DOZÊN KU LÊ HATIN VEKIRIN Û JIYANA WÎ YA GIRTÎGEHÊ

Mirov nizane vê mijarê çawa vebêje. Lewra çî çax lê fersend anîne, an doz lê vekirine an jî avêtine girtîgehê. Ger ku mirovek bi taybetî li ser vê mijarê bixebite dikare bi sedan rûpelan tişt binivîsîne. Lê em dikarin çend dozên ku hem di dîrokê de hem jî di jiyana wî de cihê xwe girtine vebêjin:

49'lar: “Heya ku li baxçeyê êsîriyê gul bim, ez dê li baxçeyê azadiyê stirî bim çêtir e.”* Di 7ê Kanûna 1959an de tîn girtin. Pêşiyê pêncî kes in, piştî ku Emîn Batû diçe li ber rehma Xwedê, 49 kes dimînin. Ji ber vê bi navê ‘Doza 49 kesan’ di dîrokê de navê xwe girtiye. Mûsa Anter jî li Amedê digirin û tînin girtîgeha Harbiyeyê.

23'ler: Di sala 1963an de 23 kes bi hevdu re tîn girtin. Pêşiyê dibin

- 1- Dicle Kaynağı: 1948, bi zimanê tirkî.
- 2- Şark Mecmuası: 1951, bi zimanê tirkî.
- 3- Şark Postası: 1954, bi zimanê tirkî.
- 4- İleri Yurd: 1958, bi zimanê tirkî û kurdî.
- 5- Doğ u Dergisi: 1969, bi zimanê tirkî.
- 6- Barış Dünyası: 1962, bi zimanê tirkî.
- 7- Deng: 1963, bi zimanê tirkî û kurdî.
- 8- Dicle-Fırat: 1962, bi zimanê tirkî û kurdî.
- 9- Yeni Ülke: 1990, bi zimanê tirkî.
- 10- Welat: 1991, bi zimanê kurdî.
- 11- Rewşen: 1991, bi zimanê kurdî.
- 12- Özgür Gündem: 1991, bi zimanê tirkî.
- 13- Tewlo: 1992, bi zimanê kurdî.



‘embarekê ku li qesra Yildizê a Abdulhemîd e. Dû re çend dadgeh doza wan lêvedigerînin û piştire dibin girtîgeha Mamakê a li Enqerê.

Girtina 1970yan: Mûsa Anter û du havalên wî yên ji Amedê bi biryara dadgeha duyemîn a cezayê ya giran ku li Enqerê ye tîn girtin. Pêşiyê bi biryara daliqandinê ve tîn bendî kirin. Lêbelê piştê 15 rojan şûnde tîn tehliye kirin.

DDKO: Piştê derbeya 12ê Adarê tê girtin. 32 mehan hem ji doza DDKO hem jî ji doza T-KDPyê tê girtin.

BERHEMÊN MÛSA ANTER

Birîna Reş

Ev berhem meriv dikare bibêje şahê berhemên wî ye. Lewra di demek wisa de hatiye nivîsîn ku wê demê tu kesî nikaribû bigota ez Kurd im jî. Hem di zîndana Herbiyeyê de hem jî bi zimanê Kurmancî hatiye nivîsîn. Meriv dikare bibêje di komara Tirkiyê de bi tîpên latînî û bi zimanê Kurmancî berhema yekem e ku hatiye nivîsîn. Ev berhem di sala 1959an de hatiye nivîsîn û di sala 1965an de çapbûye. Di celebên edebiyatê de nav celeba şanoyê de cihê xwe girtiye. Karakterên wê: **(Zîno, Biro, Misto, Bedo, Apê Sado, Seroxan, Kelos, Reşo, Xensê, Silo, Xort, Gulê, Buharê)** ne. Berhem ji aliyê mijarê

û naverokê ve gelek serkeftî ye. Lewra suhbet, bûyer, nirxandin, nakokî û hêviyên di berhemê de bi bêhna jiyana Kurdan hatiye hûnandin. Dema ku meriv têkiliya Zîno û Biro dixwîne, dê û bavê meriv tîn bîrê. Wexta ku mirov çîrok û meselokên Apê Sado dixwîne, ji meriv wetrê ku meriv di nav ce-maeteke kalan de ye. Çaxê ku Silo şekirê xwe naxwe û ji bavê xwe re vedîşêre, danûstandina meriv a zarokatiyê tîne bîra meriv. Yanê dixwazim bibêjim ku ji her aliyê ve mirov bi birînên xwe yên reş dihese di nav Birîna Reş de.

Muslum Yucel di nivîsek xwe de wiha dibêje: *“Berhem ji bilî Tirkiyê, li Çakoslovakya, Belçîka, Hollende, Denîmarqa û li Swêdê li ser dikê hatiye lîstin. Şahap Balcioğlu, li şayesên piyêsê yên li sehneyê nêrt û wêne xêz kirin. Di Birîna reş de bi kurtahî mijar wiha ye: DPê li rojhilatê bi axa, beg û şêxan xwe li peya digirt. Wê demê Axa, bi enirîna xwe, Şêx, bi fetwayên xwe û Beg, bi tasek dewê xwe dikaribûn ji hemû kesî re keytiya xwe diyar bikirana.”*³

Apê Mûsa jî der barê Brîna Reş de wiha dibêje: *“Xwendevanên delal, min ev pirtûk sala 1959an li Stenbolê, li Herbiye di hucre 38an de wextê ez girtibûm, nivîsibû.*

Tiştên ku hûnê di vir de bixwînin gişk serpehatiyên min in.

Li rojhilatê ‘Brînên Reş’ pir in. Wek bîrova çavan, êşa zirav,

kotîbûn û a ji van gişkan diwartir û
diya wan jartî û nezani û feqîrtiyê.

*Hûnê niha tiştên ku van êş û
bela anîne serê me, di vê pirtûkê de
bibînin.*⁴

Qimil

Di sala 1962yan de ev pirtûk
li ser helbesta Mûsa Anter a ku
di rojnameya “İleri Yurd”ê de
hatibû weşandin wek pirtûkeke
nirxandinê ye. Ji ber ku naveroka
pirtûkê, ji helbesta Qimil, nivîsên
ku di çapemeniyê de li ser Qimilê
hatibûn nivîsîn, biryarên Dadgehê
a li ser doza Qimil, raporên pispor-
ran û hwd. çend pêkenokên din ve
derketibû.

Hatıralarım (Bîranînên Min)

Apê Mûsa dema ku dest bi
nivîsandina bîranînên xwe dike,
tam 70 salî bûye. Ji ber wê dibêje
nivîsandina min bêmefer dixuya.
Her çi qas wisa gotibe jî Bîranînên
Apê Mûsa wek du cilt û bi zimanê
Tirkî li ber çavên me ne. Mîna ku
dibêje çi heyf e ku bi zimanê Tirkî
bû. Lê bixwe ji bo vê yekê gelek di-
kesire. Dibê ku emrê min têrê bike,
dê kurmancî jî derê. Lê mixabin ev
daxwaza wî nahate cî.

Ciltê yekem ji pênc beşan
pêktê. Zêdetir di vî cîldê de qala
kar û xebatên xwe kiriye û xwe
daye nasîn. Cîldê duyem jî ji du
beşan pêktê. Di vir de zêdetir li ser

têkiliya xwe û kesên din sekiniye.

Apê Mûsa bi gotineke xwe ya
delal jixwe naveroka vê berhema
xwe puxte dike: “Ez şahidê zindî û
sondxwarî yê tengasiyên Tirkîyê yê
55 sala me. Gelo ez tenê şahid im?
Na! Ez her wiha mehkûm, bersûc û
dozdarê Tirkîyê me.”⁶

Ferhenga Kurdî: “Ferhenga Khurdî-Tirkî”

Ev xebata xwe di sala 1963yan
şûnde li girtîgeha Enqerê ya
Mamakê dinivîse. Qasê 11 hezar
peyvên di xwe de dihewîne. Piştê
ku ji girtîgehê dertê di sala 1967an
de diweşîne. Taybetiya vê ferhengê
ew e ku tu çavkanî, pirtûk, ferheng
û tiştên hwd. di destê Apê Mûsa de
tunebûne û wisa nivîsiye.

Vakayiname

Di “Vakayiname” de di navbera
qewimîna bûyer û nivîsandina wî
de zêde dem nebihuriye. Ev ber-
hem ji waqî’ayên wî yên di navbera
1987 û 1992yan de der çûye. Di
sala 2002yan de ji weşanxaneyê
Avestayê çap bûye.

Fırat Marmara’ya Akar

Ev pirtûk di sala 1996an de ji
aliyê weşanxana Avestayê hatiye
çapkirin. Zimanê wê bi Tirkî ye.
Berhem, ji mijarên klasîk, hin me-
qale, ceribandî û berhevkirinên
derketiye.

Çinara Min

Ev pirtûk di sala 1999an de li weşanxaneya Avestayê hatiye çap-
kirin. Naveroka pirtûkê ji nivîsên
Mûsa Anter ên di sala 1992an de di
rojnameya Welat de hatine nivîsîn
û wekî din çend nivîsên ku di kova-
reke mîzahê ya bi navê Tewlo de
hatine nivîsîn derdikeve. Pirtûkê
navê xwe ji nivîsa ku di 7-13ê Adarê
de hatiye weşandin hildaye. Nivîs
hemû bi zimanê Kurdî ne. Nivîsa
ku li jêr hatiye nivîsîn beşek ji nivîsa
Çinara Min e.

“Di 1951ê de çûm gund min çina-
rek çand. Niha du metro û niv stûr
û 50-60 metro jî bilind bûye. Jixwe
min divê ez tirba xwe di bin de
çêkim. Wê salê min nêrî ku terhik ji
ber çûye. Hecî Mehmûdê Stilîfî bang
min kir û go:

Şêxo wer ez tiştêkî pêş te bikim.
Ez çûm Mehmûd ew tirhik pêş
min kir. Û got;

- Tu zanî çî hat bîra min?

Min go;

Çî hat bîra te?

Go;

Ez dibêm tu wek vê çinarê yî û
ev telebên me yên li çolê wek vê
terhikê ne, ji ber te çûne.

Ez keniyam, min xwe da vî alî û wî
alî belkî ji tirsra jî be, li min nêrî ku
xebera wî ye.

Îca ez terhik ji ber kîjan çinarê
çêbûme? Ew çinar niha hişk bûne,
ez mame. Dibê ku ez jî hişk bibim
terha ku ji ber min çûye bibe
çinar. Ez ji ber Cegerxwîn çûme,
ji ber Celadet Bedirxan çûme
û ên din. Niha li dinyayê, agirê
Olimpiyatê heye. Dibên berê di
Yewnana qedîm de lîskek wan
hebû, agir pêdixistin xort dibezî-
yan, xortekî agir dida dest yê din.
Bi vî hawî bi hezaran xort ew çira
didan dest hev heta ku bigihana
Akrepola armanca xwe.”

QIMIL

Bi çiya ketim lo apo, çiya melûl bûn rebeno
Ceh seridî lo apo, genim hûr bûn evdalo
Qimil hatî lo apo, bi refa ye rebeno
Xwar genimî lo apo, hiştî ka ye rebeno
Hat qimil lo apo, ji zozana lo apo
Xwar genimê me xizana lo apo
Ro hatibû lo apo wexta dana lo apo
Pez herikî lo apo ser şivana rebeno
Car kulekê me man apo li ser guhana rebeno⁵



Hevdîtina Mûsa Anter û Seîdê Kurdî⁸

Qasê ku Apê Mûsa di bîranînê xwe de vedibêje mesele wiha di-qewime: Em dizanin ku Abdurehim Zapsu xezûrê Apê Mûsa û heval, hogir û hemwelatîyê S.Kurdî ye. Di herba yekemîn de Abdurehîm Zapsu û S.Kurdî dîl dikevin destê Êrisan û piştê bi hevdû re bi gelek zor û zehmetîyan tên Stenbolê. S. Kurdî di sala 1945an de ji bo doza ku lê hatiye vekirin, tê Stenbolê. Dibe mêvanê A. Zapsu. Apê Mûsa jî êvarek teklîfatîya xwarinê datîne. S.Kurdî û wekê din gelek alimên Kurd ên mîna Şêx Şefîq Arvasî, Şêx Emînzade, Şêx Mustefayê Bilîsî, Mekkî Arvasî, Cemalettîn Arvasî vedixwîne teklîfatîyê. Apê Mûsa dibêje: Piştî nan suhbetek gelek xweş hebû. Heya wê demê min qet xeber nedabû, hê min mazûvanî jî ji A. Zapsu re hiştibû û min xizmet dikir. Lêbelê deyaxa min nemabû û dibe ku piçek jî bi çorsî min ji Bediuzzeman pirsî: “Ustadê min, tiştê ku min ji zaroktiya xwe heya niha bihîstibû û navek we yê bi navê Melayê Seîdê Kurdî ku ji gelê Kurd re sempatîk bû, hebû. Lê niha Tirk ew qas eza, cefa, tadeyê li we dikin, mişextê welatên biyanî dikin, davêjin zîndanên û we aciz dikin, lê hûn hê jî hewlek wisa didin ku Tirka bişeynin bihiştê. Ev karekî çawa ye... min fêhm nekir.” Di vê navbeynê de Apê Mûsa diyar

dike ku suhbet hemû bi Kurmançî bûye. Apê Mûsa wiha didomîne: Wan çavên xwe yên nûrfeşan û ilimbar wek projektorekê ber bi min zîvirand û bi rûkenî got: “Ev kî ye Abdulrehîm?” Xezûrê min jî got: “Ev xort zavayê min e.” Ustad got: “Wey! Kurê min, ka were ba min.” Ez çûm li ber rûniştim. Destê xwe avête ser stûyê min, min maç kir û got: “Kurê min hîn zaro yî tu nizanî ez çî dikim. Bixwîne ilm hîn bibe.” Mêvanên din ji samîmiyeta me qayîl bibûn. Ji ber ku Ustad kî ramûsanda û destê xwe li piştê wî bida, dihate wî maneyê ku ‘ez ji te razî me.’.....

Der barê Apê Mûsa de çend gotinên Yaşar Kaya⁹

Min Zerdeşt nedît, Seîdê Kurdî dît. Hûn her sê li ber hev di heman liq û tîmê de çî qas zehf dişibayan hev. Derwêşîya we, qelenderiya we, riyê we yê spî û çavên we yên nurfeşan û ronbar mîna hev bûn. Min bibexşînin, doktrînen we cihê cihê bûn, lê hûn her sê jî kedkarê gelê min ên rihspî bûn.

Yaşar Kemal qala Mûsa Anter dike¹⁰

Dema ku ez bîst û pênc salî bûm, min Mûsa Anter nas kir. Heval û hogiriya me ew roj ev roj e ber-dewam dikir. Her dem bi çavekî baş dinya dinirxand. Di rojên herî tarî, herî zilimbar de jî ew her ruh-zelal, hêvîdar û bawermend bû. Di mirovê herî xirab de jî li rûyekî

xweş digeriya, ew rû didît û dikir ku bi wî rûyî jê hez bike û fêhm bike... Di dawiya tarîtiyên herî kûr de li çirûskêkê digeriya û didît. Reşbîniyek herî giran de hêviyek disincirand...

Der barê Apê Mûsa de çend gotinên Îsmail Beşikçi¹¹

Kurdbûn di roja îro de tiştek gelek zor e. Qasê ku zor e bi rûmet e jî. Min kekê Mûsa di sala 1967an vir de nas dikir. Ji naskirina min bigre heya niha Kurd bû.

Bêguman ez dizanim ku kekê Mûsa di gora xwe de bi rehetî û rûgeşî radizê. Lewra yên mîna Mûsa Anter, di salên 1950î de sê çar kes bûn. Lêbelê îro bi hezaran, dehhezaran in... Şadûmaniyek ji vî mazintir heye gelo? Wekî din ez dizanim ku kekê Mûsa piştê sala 1984an bi ruh û heyecanekî nû şadûmaniya dilê xwe bi dest xistiye.

Mûsa Anter, mirovekî Kurdan ê leheng û delal bû. Ez bawer im ku yê heya heya bê bîranîn...

Şêwe û şêwaza Apê Mûsa û nîrxandina Evdile Koçer¹²

... Surgun warê hunera mîzahê ye! Di vir de mînaka herî mezin Mûsa Anter e. Çawa ku em dizanin Apê Mûsa hem nivîskar hem siyasetmedar hem jî henekbêjekî mezin bû.

Lê berî her tiştî ew bi henekbêjiya xwe bûbû “Apê

Mûsa”. Mîzaca wî ya mîzahî di pêşiya her tiştî de bû. Bûyer û qewimînên siyasî û jiyane, bi entelektueliyeke têr li gorî şêwaza xwe ya mîzahî vedigot û dinivîsand. Meselok û pêkenokên Apê Mûsa, di devê civaka me de bûne folklorîk.

Min gelek caran dîtiye ku, di nav civatê de kesekî/ê wiha dest bi meseleyeke henekî kiriye: “Apê Mûsa rojekê...” Yanê ev dihat wê maneyê ku Apê Mûsa wekî Behlûl, Melayê Meşhûr, Nîsredîn Xoce û hwd. bi rabûn û rûniştandina xwe ve, bi henek û meselokên xwe ve ketibû tûrikê folklorê û ji ser zimanê gel danediket...

Teoriya “Kart û Kûrtê” hilweşiya; de ya Ellah coban bişidînin belkê xwe bi vê çingalê bigrin

Di dema herba dîyemîn de, dema ku ew qas tengasî, birçîbûn, dijarî hebû, dema ku perê yekê hebûya jî xwarin tunebû ku meriv bikiriya û bixwara. Tam di demek wisa de Mûsa Anter li taxa Beyoğlu li ser kolana Îstiklalê bi navê “Beyoğlu Kantin” cihek vekiribû. Aşxane û beqqalek wî gelek dewlemend hebû. Rojekê du kal di milê hevdu de tîna karxaneya Mûsa Anter. Apê Mûsa çawa ku wan dibîne dinase. Yek ji wan mamosteyê Mûsa Anter ê li ser dada cezayê profesor Tahir Taner bû. Yê din jî wezîrê karûbarên derve yê kevin Numan Menemencioğlu bû. Ji ber

ku Apê Mûsa qedrê wan digirt, têkiliya wan gelek xweş, suhbeta wan pir geş bûbû. Van herdu zilaman ji demek zû ve hev nas dikirin. Herdu berê bi hev re di Konferansa Lozanê de şewirmendiya dadê ji Îsmet İnönü re kirine. Çima ku ji Apê Mûsa xweş bûn car carina dihatin kargeha wî û suhbet dikirin. Tam di suhbeteke wiha de Numan Mene-mencioğlu bîranînek xwe bi wan re parvekirîye:

“Churchill û Roosevelt ji bo ku em bikevin herbê di sala 1943yan de min û İnönü vexwendin Qahîreyê. İnönü ji bo ketina herbê erênî nedifikirî. Hem li Edenê û hem jî li Qahîreyê nêrîna İnönü ev bû: ‘Artêşa me ya heyî artêşeke ku bi-karibe şer bike nîne. Artêşa me bi cîhazan bixemilînin û derxînin asta artêşa xwe, piştî emê ser çav û ser serê xwe bikevine şer.’ Lêbelê ne Churchill û ne jî Roosevelt qîma xwe bi Tirkan nedianîn. Digotin piştî xemilandina artêşê ku derbasê

aliyê Almanan bibin ew çax emê çi bikin? Lêbelê carek bi meselokek wiha ve me bi Pirsgrîka Kurdan dane tirsandin. Me’lûm e, ji ber ku hatibûn alema Îslamê, bi xwe re çend oryantalistên ku her yekî ji wan zimanên şerqê dizanibûn, anîbûn. Hema di derbekê de ji İnönü re got:

“Paşa, tu bi Kurdî dizanî? İsmet İnönü şaşopaşo bibû. Nîzanibû dê çi bigota. Hê wî tiştêk negotibû ez ketim nav suhbetê û min zûka got: ‘Ekselans, em Kurdî nîzanin. Jixwe li bal me Kurdî nayê axaftin û zimanekî wisa jî tune.’ Churchill ji merivên xwe yekî pirsî û dema ku got: ‘Qey wisa ne Mister, zimanekî bi navê Kurdî tune?’ Mêrik, ji pêşiyê ve xwe hazir û nazir kiribû û zûka rabû ser piya, ‘Çawa nabe Ezbenî?’ Zimanekî Kurdan ê gelekî dewlemend û edebî heye.

Got ger hûn hezdikin, -me heya wê gavê sehnekiribû. - ji Dîwana Cizîrî ji we re helbestekê bixwînin.



Nusxeya Rojnameya **Özgür Gündem**ê a Rojek Piştî qetilkirina Apê Mûsa

Churchill got, 'Bixwîne.' Me fêhm nedikir lê helbesteke newaze ku piçek aliyê fonetîkê ve dişîbiya Farisî xwend. Û piştire got ev helbest bi Kurdî ye. Got, 'Ger wisane vê helbestê ji me re binivîse. Nivîsî. Churchill got, 'Vê ji me re wergerîne Îngilizî.' Wergerandin. Got, 'Yek jî bi Fransizî wergerînin.' Ew jî çêkirin. Wekê din wergerandin Tirkî jî. Û ji min re got, 'Mosyo, ka tu jî were vir. Ka dêna xwe bidê ji bo ku di her sê zimanan de heman fikrê bînin zimên gelo hewcedariya çend peyvên biyanî hatiye dîtin.' Di Fransizî de qet tunebû. Di Îngilizî de çend peyvên ku koka wan Latînî bûn derketin.

Di zimanê xwe yê orjînal de çend peyvên Erebi hebûn. Lê di nusxeya Tirkî de ji qertafa"dir" û ji gîhaneka "ile"yê pêştir, tu tişteki Tirkî tunebû. Hin ji wan Erebi, hin jî Farisî û yê mayî jî ji zimanê Ewrûpayîyan yê cûrbecûr bûn. Churchill her çar rûpel jî dan ber çavên me. Bi şêweyek mîna ku bibêje, 'Hûn qet fedî nakin' û got: 'Lê binêrin, ew zimanê ku hûn dibêjin tuneye û zimanê ku li welatê we nivê mirovan zehftir wek zimanê dayika xwe pê diaxivin, Kurdî ye û xwedî dewlemendiyek çawa ye.'

"Bawer im di wezîrtiya min a karê derva ya ew qas dirêj de ez tu roj, mîna wê rojê bêhtent û mehcûb

ÇAVKANÎ

- 1-Anter, M. "Hatîralarım", Önsöz, Avesta, 2007, İstanbul.
- 2-Anter, M. "Hatîralarım", Mardin, Avesta, 2007, İstanbul.
- 3-Yücel, M. "Özgür Gündem", Kavganın susmayan kalb. kon. o, 23 Eylül 1992.
- 4-Anter, M. "Brîna Reş", Giriş, Avesta, 1999, İstanbul.
- 5-Anter, M. "Rojnameya İleri Yurd", Qimil, 1959, hejmar: 500, Amed.
- 6-Anter, M. "Hatîralarım", Berga paş, Avesta, 2007, İstanbul.
- 7-Anter, M. "Çinara Min", Berga paş, Avesta, 1999, İstanbul.
- 8-Anter, M. "Hatîralarım", Saidî Nursî(Kürdî), Avesta, 2007, İstanbul.
- 9-Kaya, Y. "Koca Çınar Kürt Bilgesi Mûsa Anter", Önsöz, yurt kitap yay., Ankara.
- 10-Kemal, Y. "Yaşar Kemal, Mûsa Anter'i Anlatıyor", 26 Eylül 1992, Cumhuriyet.
- 11-Kaya, Y. "Koca Çınar Kürt Bilgesi Mûsa Anter", Özgür gündem gazetesine, yurt kitap yay., Ankara.
- 12-Koçer, E. "Koçername", Mîzah; Warê Surgunê, do, 2009, İstanbul.
- 13-Anter, M. "Hatîralarım", Harp yılları(Kahire toplantısı), avesta, 2007, İstanbul.

* Emin Batu di girtîgeha Harbiyeyê de bi xûna ku ji devê wî hatiye, nivîsandiyê.

Ji înternetê:

-<http://bianet.org/biama/gifade-ozgurlugu/109840-ape-Mûsa-baris-mucadelesinin-adiydi>

-<http://www.evrensel.net/01/09/18/dosya.html>

-<http://www.birikimdergisi.com/birikim/makale.aspx?mid=661&makale=>

-www.aktuelbakis.com

-<http://hasat.org/forum/Tewlo-k52746s1.html>

-<http://www.bydigi.net/candi-gisti/139144-Mûsa-anter-u-serboriya-ferhenga-kurdi-ya-ansiklopedik-i.html>